

"ENKS li ser yekrêziyê rijd e û aliyê din xwe direvîne"

Kurdistan Ehmed Omer



Di dema dawî daxuyaniyên serkirdeyên PYNK li dijî yekrêziya Kurdî gelekî zêde bûne û herî dawî jî serokê şanda PYNK Aldar

Xelîl ragehandibû rêkeftina ligel ENKS xiyaret e ji xwîna şehîdan re.welatîyên Kurdistanê Sûriyê vê mijarê dinexînin û dibêjin ew alî naxwaze yekrêzîbiçe

serî. Mehmûd Xidir wiha dibêje, Aldar Xelîl û ew baskê pê ve girêdayî hertim dixwaze ev yekrêzî û danûstandin neçin serî ji ber ku ne ji berjewedniya wê û ya

PKKê ye, ew dixwazin alozî her berdewam be heta ku bikaribin samanên Kurdistanê Sûriyê bidizin. Şîlan jî wiha dibêje, ENKS bi hemû hêza xwe rijd e lis er serkeftian

danûstaninên ligel PYNK, lê hin kesayetiyan di nava PYNK de û di serî de Aldar Xelîl li dijî yekrêziyê ye, lê di baweriya min de ew neçar beşdariyê di

civînan de bike. Xelkê me ji van daxuyaniyan bêzar bûye û divê aliyê gerantîkar vê yekê rawestîne.

Nabe astengî ji prosêsa xwendinê re werin durist kirin

Kurdistan-
Nadiye Xelef

Li bajarê Amûdê hejmarek ji xwendekaran ji bo azadkirina mamosteyên ji aliyê asayîşa Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD ve hatine girtin, derketin xwepêşandanê. Xwendekaran ji bo nîşandana nerazîbûnê derbarê girtina mamosteyên wan ji aliyê asayîşê ve, derketine xwepêşandanê û daxwaza azadkirina mamosteyên xwe dikin. Di çend rojên borî de li bajarê Dirbêsiyê û Amûdê hejmarek mamosteyan ji aliyê asayîş PYD ve hatibûn girtin. Hinceta girtina wan mamosteyan jî ew e, ew li malên xwe û li cihên taybet sîstema xwendina ya rejîma Esed didin xwendekaran. Welatîyek di vê derbarê de wiha dibêje, Heger rêveberiya PYD ji zimanê Erebi dilgiran e, bila ji destpêkê ve ev xuleyên taybet qedexa bikira, ne niha ku ezmûn nêzîk bûne û me rêbaza xwe bi nivî kiriye. Xwediyê me xerciya xwendina me ji devê xwe derxistine ji bo em bixwînin, niha jî qedexa dikin. Pirsê perwerdeyê li Kurdistana Sûriyê, bûye barekî giran li ser milê xwendekaran. Xwendekarên li dibistanên rejîmê dixwain bi zorê û di jêr siya tirsê asayîşa PYDê çûn û hatinê dikin û rojan rastî pirsgerêkan tîn û ewên li dibistanên rêveberiya PYDê dixwînin pêşeroja wan tarî ye û nizanin dê çarnivîsa wan çi be di pêşerojê de. Derbarê girtina mamosteyan

Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) di daxuyaniyekê de girtina mamosteyan ji aliyê hêzên asayîşê ve şermezar kir û got, "Ev pêngav ne tenê bo ziyanehandina bi xwendevanan e, lê belê bo derxistina zêdetir a dilgiranî û tirsê di nav xelkê de û zêdetir sepana zordariyê ye, da ku rê li pêşiya ciwanên kurd bigirin û nehêlin ew bighin zanîngehan. ENKS tekez kir jî: "Ev yek jî dijî mafê mirovî û hemu prensîb û peymanên navdewletî û mirovî ye. Herweha danîna zêdetir a astengiyên li pêşiya destpêkirina diyaloga Kurdî û ne serxistina wê ye." Mihemed Elî derbarê mijara perwerdeyê li Kurdistana Sûriyê ji Rojnameya Kurdistan re wiha got: "Bi rastî mala xelkê me xerab bûye, ji berk u ew zarokên xwe bi zorê û heft bela dişînin dibistanan û pereyê zêde lis er wan xerc dikin û di dawiyê de asayîşa PYDê her tiştekî li wan qut dike ev yek bi xwe tawaneke li dijî mirovahiyê û divê dengê van xwendekaran bighê tevahiya cihanê, tik es ne li dijî xwendina bi zimanê xwe zimanê Kurdî ye, lê ne bi vî şeweyê ku rêveberiya PYDê died, ne danpêdan pê tê kirin, û ne jî asta wê bilind e û rêbaz rêbaza PKKê ye û ev yek metirsiyê mezîn li ser nîfşên bê çê dike, xelk dixwazin zarokên wan xwendineke baş bixwînin û nebin beşek ji îdyolojiya PKKê ku dixwaze di riya dibistanan de zarokan çekdar bike û guh nedin xwendinê, û bi rastî ev yek jî tê kirin û zarok ji dibistanan

têne revandin û ji bo rahênana leşkerî têne birin, ev yek jî tawaneke li dijî mafê zarokan e, lewma divê çareseriyek ji vê pirsgerêka çarenivîsaz re were dîtin ji ber çarenivîsa nîfşekî bi temam pê ve girêdayî ye. Can Xalid jî li ser vê mijarê wiha dibêje, tekez ti Kurdek li dijî zimanê xwe nîne miletê me

dixwaze zarokên wan xwendineke danpêdankirî bixwînin, û çarenivîs û pêşeroja wan diyar be û durrî tariyê be, xwendina li Şamê gelekî baştîre ji îdyolojiya PKK ku niha bi dare zorê dixê serê xwendekarên me li bajarên Kurdî li Kurdistana Sûriyê, divê Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS bi

cidî lis er vê pirsê raweste û vê karesatê rawestîne ku niha rastî xwendekarên me tê, di wê baweriyê de me di çend salên bê de hejmare xwendekarên me yên xwedan bawernameyên danpêdankirî gelekî kêmbûn û ev yek jî bandoreke xerab dê li ser rewşa jiyanê li Kurdistana Sûriyê çê bike, heger

pizîşk û endezyar û mamosteyên me kêmbûn bibin dê rewş gelekî aloz bibin û dê emê bi hewceyî kesên şareza bibin, û tiştê ku PYD û PKK dixwaze ev e ku xelk biin çekdar û bikevin nava refên çekdarî daku nîfşekî nezan û cahil ava bibin û tenê îdyolojiya PKKê di serê wan de û jibîlê wê yekê ti tiştêkî din nizanibin.



Romana Nivîskar Narîn Omer Seyfedîn "Henasên Jiyanê"

Lokman Polat

Hem li bakur û hem li rojavayê Kurdistanê her diçe hejmara jinên romannivîser zêde dibe. Romannivîserên jin ên li bakurê Kurdistanê her yek du, sê romanên kurdî nivîsîne. Li rojavayê Kurdistanê jî di serî de romannivîsera jin Vejîna Kurdî û hinek romannivîserên jin ên din her yek çend romanên kurdî afirandine. Niha yek li wan romannivîseran zêde bû, ew jî Xanim Narîn Omer Seyfedîn e.

"Henasên Jiyanê" navê romana Narîn Omer Seyfedîn e. Roman di nav weşanên "Sersera" de li Almanyayê derketiye û 164 rûpel e. Navê romanê ê tam "Henasên Jiyanê - Koçberiya bêhenas" e. Nivîskar Narîn romanê diyariyê malbata xwe kiriye. Ebdulhekîm Ehmed Muhamed ji bo romanê pêşgotin nivîsiye. Biradostê Mîtanî jî bi sernavê "Nêrînen taybet" gotarek nivîsiye û nixandina xwe pêşkêş kiriye, pirtûkê û nivîskara wê bi kurtahî şîrove kiriye. Ji navê romanê jî diyar dibe ku mijara romanê henasên koçberiyê ye. Koçberî bûye qedera kurdan. Digel gelek sedeman, bi taybetî jî sedemên siyasî û aborî, di esasê xwe de bêdewletbûnî bingeha sedemên koçberiya kurdan e. Welatê mirov rizgar nebe, gelê mirov azad nebe, zimanê mirov qedexe be, di welatê xwe de mirov li dibîstanê bi zimanê xwe perwerde nebe, statuyeye netewa mirov tunebe, dê bi sedhezaran hemwelatîyên mirov, gelê mirov ji neçarî, ji ber êrişê dagirkeran û dijminên hov bibe koçber, koç bike here welatên Ewropayê, li wir bibe penaber û bi hesreta welatê xwe binala.

Di romana Narîn Xanimê de zahmetiya jiyana koçberiyê, hesreta welat, axîn û nalîna jiyana kambax a penaberiye tê rave kirin. Nivîskara romanê Xanim Narîn Omer Seyfedîn wek mihendisê/endezyarê civakê, di nav civaka kurd a penaberiye de neynika hunera wêjeyê li ser civakê digerin û berxwedana jinê a jiyane pêşkêşê xwendevanan dike.

Alozî û neheqiyên jiyana penaberiye, di nav civakê de pirsgerêkên malbatî, pêkanîna adet û toreyên tradîsyona kevnare di berhemeke realîzma civakî û netewî de bi hunereke wêjeyî hatine hunandin û bi şeweya romanê hatiye afirandin.

Roman bi devê vebêj/nivîskar bi hezkirina ji pênuşê dest pê dike. "Pênuş li ba wê hevalek dilsoz e." Ev pênuşa xwe dilorîne û pirsra jinan, derd, kul, keder û axînen wan tîne zimên. Romana Xanim Narîn Omer Seyfedîn romaneke li gor rêbaza şeweya ekola realîzma civakî hatiye afirandin. Di romanê de cîhaneke xeyalî û herweha leheng û kesayetiyên xeyalî tunin, ên rasteqînî hene. Henasên jiyana malbateke bi şeweya realîzma civakî/sosyal realîzm hatiye rave kirin.

Di romanê de mijareke pir girîng, birîneke kûr, êşeke civakî tê qal kirin. Mijara kuştina jinan û herweha kuştina keçan ku alî bav î birayên wan ve, kurapê wan ve tîne kuştin di naveroa romanê de cih digre û bûye mijara bingehîn a romanê. Simoyê Selîmo keça xwe kuştîye, hem jî keçika ducanî, yekî bi navê Ferhad keçikê hemîle dihêle û wenda dibe, direve diçe, xwe dide alî. Simoyê Selîmo jî ji bo ku keçik hemîle bûye, Xwedêgiravî leke hatiye ser namûsa wan lewre jî keça xwe dukuje. Ma suc û gunehê keçikê çiye? Ê tawanbar, sucdar Ferhad e. Dema mirov di jiyana rastîn de bûyerên weha dibihîse yan jî di berhemeke wêjeyî/edebî de dixwîne mirov gelek aciz dibe, nerehet dibe, nalet tîne.

Bûyerên weha hov, ji bo Xwedêgiravê namûsê (!) kuştina keç û jinan netenê di nav civaka kurd de heye, ev tişt di nav gelên rojhilata navîn de, di nav kurd, tirk, afgan, arab û farisan de heye. Ev tiştê kirêj û hov bingeha xwe ji ola Îslamê û ji adet, tore û tradîsyonên paşverû ên kevnar yên civakê werdigre. Çi heyf ku herî pir jî di nav kurdan de heye.

Di romanê de malbata ku bûye koçber û li welateke Ewropayê bûne penaber, di nav pêvajoya jiyane de keça wan ji yekî nemisilman/neîslam hez dike. Bavê keçikê yekî îslamperestekî paşverû ye. Dema diya keçikê jê re dibêje ku keça wan ji xortekî nemisilman hez dike, bav bi tundî li dij derdikeve û keça xwe tehdît dike, dibêje; "Ez ê te bikujim. Ez qet te nadime wî gawirî." Tirsra ku ew ê here cehehemê/dojehê wî digre û ji keça xwe re dibêje: "Ji Xwedê lêborîn bixwaze. Beriya li te were xezebê û felaketê bi ser me de bîne." De li vî misilmanê ehmeq binêrin, tu bijî qey wekîle Xwedê/a ye ku li ser navê wî/wê biryar dide. Li gor ehmeqên weha tu dibêji qey ew qulê Xwedê/a nîn in û Xwedê/a tenê Xwedayê/a misilmanan e.

Keçik ji bavê xwe re dibêje: "Yabo! Ew soz dide min ku her yek ji me li gorî ola xwe bijî, heta zarokên me jî wê serbest bin di ola xwe de, bivin li ser ya wî bimînin an jî li ser ya min." Bav jî dibêje: "Keçê, ew gawir lawê gawira ye, te divê heta zarokên te jî bibin gawir?" Keçika bêmiraz û belengaz li hember zordarî û sîtemkariya bavê xwe lawaz dimîne. Bavê keçikê bi

birayê xwe re diaxife û paşê ji jina xwe re dibêje "Min keçikê da kurê/lawê birayê xwe."

Min jî di pirtûka xwe a bi navê "Trajediya Evîndaran" de bal kişandibû ser mijara dramayên evîndaran. Min weha gotibû:

"Di dema berê de û niha jî dema dilê keç û xortên ku olên


wan cuda ne dikeve hevûdu, anku aşiqê hev dibin, gelek pirsgerêk derdikeve pêşiya wan, evîna wan dibe evîneke qedexekirî û piraniya evîndarên ji olên cuda nagîhîjin miradê xwe. Keç û xortên xaçperest, cihû û misilman nikarin bi hevûdu re bizewicin. Kurdên misilman û yên êzîjî nikarin bihev re bizewicin. Evîndar jiyanekê trajîk dijîn, trajediya evîndaran dil û kezeb li mirov dişewitîne. Ev roman (Trajediya Evîndaran) bal dikşîne ser vî pirsgerêka qedîm ku hê jî di nav civakên cihanê de didome." Belê, di derbarê vî mijarê de, bûyerên dramatik ku tê serê evîndaran çiqas pirtûk werine weşandin ewqas baş e.

Di romana Xanim Narîn Omer Seyfedîn a bi navê "Henasên Jiyanê" de keçik ji kurikê xiristîyan hez dike û bavê Xwedêgiravî misilman li dije û dixwaze wê bi birarzê xwe re bide zewicandin. Zewaca bi mirovên xwe re xeter e, piranî zarok seqet diwelidîn. Lê kesên ehmeq, nezan, cahil çî fêrî dikin. Bavê ehmeq, zircahil, dixwaze bi zorê keça xwe bide kurê birayê xwe. Keçik li hemberê vî zewaca bédil û bîzor derdikeve û ji malê direve, li pey dilê xwe diçe. Piştî çûyina keçikê bav û apê

wê lê digerin lê ew nabînin. Di malê de bav bi jin û zarokên xwe re pev diçe, gotinên nebaş dibêje, wan tehdît dike.

Piştê demeke keçik ji malbata xwe re name dişîne û sedemê çûyina xwe ku li hemberê biryara şaş a bavê xwe derketiye û niha bi dildarê/evîndarê xwe re ye û baş e, şad û bextewar e. Bav bi bira û birarzê xwe ve fen û futa û planan çêdike ku keçikê bigrin û bikujin. Piştî demeke derbas dibe, kurapê keçikê ew dukuje û mizgîniya kuştinê ji apê xwe re tîne. Bavê keçikê î kerê ehmeq jî wî pîroz dike. Li ser kuştina keçikê masmediya wê welatî di Radio, TV û rojnameyan de derbarê bûyera kuştinê de nûçe û şîrove diweşînin. Dibêjin: "Yê ew kuştî mirov e yan hov e." Û li ser vî bûyera hov netewa malbatê jî gunehbar dikin, wek neteweyek paşketî û xwînmij didine nîşandan. Hinek jî şîrove dikin ku; nexwe ev malbata paşverû van ramanên di mejiyê xwe de xwedî dikin çima ji sînoran derbas dibin û tîne welatên demokratîk û azad. Rastî jî ev kesên îslamî ên hov çima naçin welatên misilman ku di gelek de şerîata îslamî heye û çima diçine Ewropayê û xwe davêjin bextê gawiran (!). Di romanê de netewa malbatê diyar nîn e, nabêje ku malbat kurd e, tirk e, arab e yan afgan e. Lê diyar dibe ku misilman e, mêrê malê misilmanekî ehmeq e, paşverû ye.

Ev tiştên ku min li jor di vî gotara xwe de bahs kir, ango kuştina keçikê di beşa yekem a romanê de tê qal kirin. Roman ji sê beşan pêk tê û di beşa du û sê de jî mijarên balkêş û girîng hene. Ji bo nivîs dirêj nebe (min derbarê romana Vejîna Kurd de gotarek nivîsî û weşand hinek xwendevanan ji min re meilname şiyandin û gotin nivîsa te pir dirêj e.) û ji bo ku xwendevan beşa duyem û sêyem meraq bikin, loma jî min behsa wan herdu beşan nekire. Romana Xanim Narîn Omer Seyfedîn "Henasên Jiyanê" hêjayê xwendinê ye. Divê xwendevanên kurd wê bikin û bixwînin. Min xwend, hûn jî bixwînin.



Efrîn û Cezîrê



Mustafa Hamdî

Buhara werzê zeytûna
Dar û mêxweş û leymûna
Surişt û ba û baranê
Geşdibûn riwê hemrîna
Biçûkanî em kom dibûn
Dest di dest da û nerîna
Kêf û sema doramebûn
Belabûn ferhad û zîna
Tavê zivistan girankir
Berbaranê barê xwîna
Biser kuştinê pelçiqandin
Liba tirî û zeytûna
Pir digotî yara minî
Himêza simbil û zeytûna
Har û dînin hiriç û hovin
Bibelabûna wa nerîna
Kurd bi êşin berî werza
Kurdistan ket devê dîna
Him bitrol û kanyê zêra
Para kurda tim birîna
Birîn xwezaya ya avîna
Memo wek zîn û şêrîna
Siyamendê di çavê xecê
Şerê li Kurdax û Efrîna

Cejna Evînê kiltûrekî ciwan e

"Hezkirinê ji dil bikin"

Kurdistan-
Yara Haşim

Cejna Evînê ku bi Valentine têt naskirin, hejmareke zêde ya xelkê li tevahiya cihanê vê rojê pîroz dîkin, tede xelk hezkirinê ji hevdu re diyar dîkin û her yek bi şeweyekî hezkirina xwe derdibire, çî bi anîna diyariyan yan jî şandina nameyên hezkirinê ji hev re, hin jî dibînin ku ev roj tenê ji bo Evîndaran e, lê ew bi xwe roje belavkirin û nîşandana hezkirinê ye. Di 20 salên dawî de jî li Kurdistana Sûriyê jî ev cejn bûye kiltûrek di nava xelkê me de, û xelk vê cejnê pîroz dîkin û her yek jî li gor kêf û heza xwe. Can Xalid li ser vê mijarê wiha çanda Cejna Evînê yan Valantayn ku niha li deverên me bûye kiltûr bi rastî tiştêkî xweş e, renga renga kiltûran li devera me baş e û divê em sûtê ji vê rojê wergirin û em hezkirin û aşî û aramiyê belav kirin û nebin sedemê kîn û zikreşiyê li nava malbat û heval û civakê bi giştî. Cejna Evînê ne tenê ya Evîndaran e belku ya hemû civakê ye ew bi xwe cejna belavkirina peyama hezkirinê ye ji bo tevahiya endamên civakê. Raste ev cenj di kokê de ne ya devera me ye lê cejneke xweş e û ez bi

xwe tamê jê dibînim. Jînda Ebdula jî wiha li ser vê mijarê dibêje, dema behsa cejna Evînê têt kirin ez kêfxweş dibin û ez dixwazin xelkê me bi kirdar hezkirinê bikin û belav bikin û tenê di vê rojê de hezkirin têt kirin hezkirin di tevahiya rojên salê de têt kirin, ez daxwazê ji xelkê me dîkin hezkirin belav bikin û xwe bikin pîrek ji bo belavkirina

peyama hezkirinê di nava civaka Kurdî de, hin kes vê cejnê wek ne cejna me dibîne, lê ez wisa nabînin, ez dixwazim cejnên bi rengî di nava kiltûra me de hebin da ku em sûtê jê werbigirin û bibin faktorekî giring ji bi belavkirina peyama aşî û hezkirinê li nava deverê, herwiha zarok û nifşên me yên bê li ser vê kiltûrê werin xwedîkirin.



Ezê biçim

Emel Hesên

Ji ber ku ez ji te hez dikim
Ezê biçim
Ji ber ku ez naxazim
Ti li ber çavên min Reş bibî
Ezê biçim
Lê berî ez biçim, ezê xelatekê ji te re bikim diyarî
Vê dara gula ya ku me bi destê xwe çandî
Bila ji te re bimîne bîranîn
Ji ber ku ez wisa Fêr bûm
Ez diyariyekê di Cejna Evînê de gulekî bidime te
Îro wê kî diyariyan bide tepîştî min!?
Ev dar wê şîn bibe her sal
Pêşiya Cejna Evînê
Wê gul jî vebin were
Da ku ti gulekê ji xwe re jê bikî
Ev diyariya min ji te re
Da ku ti bizanî çendî min ji te hez dikir

Xurbet



Mihemed Gabarî

Kotir li ser hêlîna hêlayî digrî
Aaaaaax
ey çûyî yê li pişt asoyên dûr
Roje roj
bi çavên xwas
ber bi rewrewkê ve dibezim
Li pişt asoyan
Xeyala te weke dûmanê pelate dibe
ji çûna te ve awazên jiyane kurt bûn li ser meqamên seba
û li ser dil bayevanên reş bilind bûn
Da diyarkin:
Bijyanê re.. jiyane nema.

